Zivrîn û vegera Iraqê

Zanyarî, vegera hemwelatiyên Iraqê û xweguncandina wan di civata Iraqê de (IRRINI)

1ê temûza 2009an

Kurmandji

Programa zivrîn û vegera Iraqê

1ê heyva adara 2008an programekî zivrîn û vegera xwazekî bo Iraqê destpêkir.

Programa veger û zivrîna xwazekî bo Iraqê (Information, Return and Reintegration of Iraqi Nationals to Iraq, IRRINI) hêsankariyan bo kesan çêdike da ku ew bikaribin bi şêweyekî xwazekî bizivirne Iraqê, û bona ku ewên zivirîne alîkariyê werbigrin da ku xwe ji nûve digel civata Iraqê biguncênin. Program ji aliyê rêxistina bêteref ya navnetewî **Rêxistina navneteweyî ya koçberiyê (IOM)** ve tê birêvebirin û deselatdarên Norwêc diravên programê didin.

Grûpa armanca programê hem iraqiyên xwedan mafê akincîbûnê ne û hem jî ewên ku mafê wanî akincûbûnê nîne. Iraqiyên ku ketine ber peymana Dublinê, yanî ew kesên ku li welatekî din xeyn ji Norwêc daxwaza penaberiyê kirine, nikarin di programa zivrîn û vegera bo Iraqê de beşdar bibin.

Programa zivirîna Iraqê ji van babetan pêk tê:

Xebata ragihandinê li Norwêc

Rêxistina navneteweyî ya koçberiyê (IOM) û Business Innovation Programs (BIP) xebata ragihandinê birêvedibin, hem dinava kampên penaberan de û hem li derveyî wan. Armanca vê xebata ragihandinê mirovên iraqî ne, xebatkarên penaberan in, karmendên kempan in û kesên din ku peywendiya wan ligel grûpa ku armanca programê ye, heye.

Ragihandina takekesî û raberî

IOM û BIP xizmeta ragihandina takekesî û raberîyê pêşkêşî wan mirovan dikin ku nirxandina zivrînê dikin. Ev xizmeta takekesî dikare bi rêya telefonê, di civînên şexsî de û bi rêya peywendîdanînê bi rêya e-mail yan nameyan bête kirin.

Lênêrîna saxlemiyê û qutan (telqîh/vaksîn)

Deselatdarên Norwêc lênêrîna saxlemiyê a xwazekî pêşkêşî wan iraqiyan dike ku dê bizivirin. Ji daxwazker tê xwestin ku peywendiyê digel doktorê xwe yê malê (fastlege), doktorekî din, bingeha pizîşkiyê (helsestasjon) yan jî doktorê xweparastinê ji vedanê (smittevernlege) bike bona qutandinê eger pêwist bibe.

Deselatdarên saxlemiyê şîret dikin ku ewên dê bizivirin xwe li dijî diftêrya, guhreqiyê û şehtiya zarokan biqutin. Bi rengekî bingehî ev cûreyên qutanê li dijî van nexweşiyan tenê mexsûsî zarokan in, û ji bona ku mezin bikaribin wan bikarbînin gerek e doktorê xweparastinê li dijî vedanê razî bibe.

Daira birêveberiya biyaniyan (UDI) mesrefa vaksînan dide. Dazwazkeren ku li kempan dijîn dikarin fatureyên para şexsî yên doktor yan jî yên bingeha pizîşkiyê digel xwe bibin kempê, da ku kemp pereyên wan li wan vegerînî. Ji dazwazkerê ku li şarewaniyê (belediye) dijî tê xwestin ku ew fatûreyên xwe bi xwe re bihêle. Daireya UDI ya herêma ku daxwazker lê dijî dê pereyên wî lê vegerînî.

Rêkxistina rêwîtiyê (seferê) û alîkarî li dema gihiştina daxwazker a xaka Iraqî

IOM alîkariyê di derheqa haziriyên pratîkî ên zivrînê de dide daxwazkeran, weku alîkarî bona bidestxistina belgeyen rêwîtiyê, rêkxistina rêwîtiyê bi xwe, bilêtên teyarê, vîza tranzît û alîkarîkirin di salona tranzîtê de di dem gehiştina welêt de. IOM hemû mesrefên rê heta bi cihê dawîn dide. IOM dikare tinê mesrefa yek xewtinê bi rêde heta ku mirov bighije cihe xwe yê herî dawîn li Iraqê bide.

IOM bilêtên vegera welêt dabîn dike. Mirov nikare bi serê xwe bilêtan bikre eger mebest ew be ku deselatdarên Norwêv dê mesrefa rê bidin.

Agadarî og raberî piştî gihiştinê

Berî birêketinê dê IOM hewceyiyên xweguncandinê yên takekesî (ferdî) yên mirovên ku dê vegerin qeyd bike. Piştî gihiştinê dê IOM li welatê Iraqê agahiyan og raberiyê bide yên vegeriyayî û dê wan bi hin kesan bide nasandin da ku ew alîkariya yên vegeriyane bikin û li wan miqate bin. IOM dê pîlanê xweguncandinê ku têde imkanên peydakirina kar û xwendinê hene, amade bike.

Alîkariya nişteciîbûnê

Kesên ku daxwaznameyên vegera Iraqê di 1ê temûza 2009an de pêşkêşkirine, dikarin bi rêya IOM daxwaza

Alîkariya akincîbûnê bikin, lê piştî gihiştina wan a Iraqê. Nizama alîkariya akincîbûnê ji hejmareke sînorkirî ji yên ku vegeriyane re tê pêşkêşkirin. Ev ew kes in ku zehmetiyeke mezin di xweguncandinê de ji ber problemên akincîbûnê dibînin . Wergirtina alîkariya akincîbûnê dê ligor mehtêciyê be, û IOM li welatê Iraqê dê binirxîne ka kî mehtêce.

Alîkariya vegerê û zivrînê
Kesên ku mafê rûniştina wan li Norwêc nîne û bi şêweyekî xwazekî di çarçeva programê de vedgerin, dê serê her neferekî 10.000 kronan werbigrin. Bona wergirtina pereyan lazim e mirov bi şexsê xwe li daireyê amade bibe piştî gihiştina xaka Iraqê. Zêdeyî vê dê program ta 25.000 kronan weku alîkariya xweguncandinê bide her kesekî ku vegeriyaye.

Kesên ku mafê rûniştina wan li Norwêc heye û dixwazin vegerin Iraqê, dê serê neferekî 15.000 kronan werbigrin.. Zêdeyî vê dê program ta 25.000 kronan weku alîkariya xweguncandinê bide her kesekê ku vegeriyaye.

Alîkariya xweguncandunê
Rêxistina IOM li Iraqê bi şêwirdarî ligel daxwazker/kesê vegeriyayî dê alîkariya xweguncandinê ku qîmeta wê 25.000 kron e birêvebibe. Ev alîkarî dê bona peydakirina kar, fêrbûna pîşeyan, alîkariya diravî bona dayina muçeyan, alîkariya diravî bona vekirin û destpêkirina projektên aborî û bona medresê û xwendinê bête bikaranîn. Programa IRRINI dê herwisa bikaribe kors û xebatên fêrkirinê yên ku dirêjiya demên wan ji hev cudan e pêşkêş bike.

Fêrkirina pîşeyê te'ehudiyê (miqaweltiyê)
BIP fêrkirina pîşeyê te'ehudiyê (miqaweltiyê), destpêkirin û bipêşvebirina şixul û projektên şexsî û bipêşvebirina pîlanên bazirganîyê li Iraqê pêşkêş dike. BIP saziyeke norwêciye û liser daxwaza deselatdarên norwêcî vê xebata han dide birêvebirin.

Daxwazkirin çawa dibe?

Daxwaznameya **zivirandina xwazekî** ji IOMê re li Oslo tête rêkirin.

Bona zanyariyên zêdetir peywendiyê bike ligel: IOM , liser hejmara telefonê 23 10 53 20 yan jî bi rêya malpera wan a Internet www.iom.no

Daxwaznameya **vegea xwazekî** ji bîroya herêmî ya daireya UDIê re li herêma te, tête rêkirin .

Vegerandina baca (zerîbe) zêde ku wan daye dewletê li xwediyan

Ew kesên ku kêmtir ji 183 rojan li Norwêc jiyane, dikarin berî vegera welatî peywendiyê bi daireya bacê, Skatteetaten, re bikin da ku texmîna baca wan pêşwext bête kirin. Kesê ku zêdetir ji 183 rojan di nava 12 mehan de, yan jî zêdetir ji 270 rojan dinava 36 mehan de li Norwêc jiyaye, dê ji aliyê bacê ve bi çavê akinciyê welatê Norwêc lê bête nêrîn. Evên han lazim e daxuyaniya xweyî şexsî ya bacê, selvangivelse, di wextê wê de ji deselatdaran re bişînin. Daxuyaniya bacê a sala vegera welat jî lazime bête rêkirin. Ji ber vê yekê, û weku beşekî haziriya vegerê, em nesîhetê li wan kesan dikin ku dê vegerin welatê xwe, ku biçin peywendiyê ligel daireya bacê ya herêmî, skattekontor, bikin.